Maahanmuuttovirasto
Migrationsverket
Finnish Immigration Service

# Guherînên bernameya hikûmetê yekser nakevin meriyetê lê heta niha tenê plan in – Dikarî nûtirîn agahiyan herdem li ser malpera me bibînî

NIha gelek pirs derbarê bernameya hikûmetê bo me tên. Bernameya hikûmetê tedbîreke siyasî ye kut ê de armanc û giringtirîn erkên hikûmetê tên diyarkirin. Guherînên mihtemel yekser nakevin meriyetê, amadekariya wan hewceyî demê ye. Dema guherînan jî niha bi deqîqî nayê zanîn.

Daîreya Koçberan qanûnan amade nake û biryara meriyeta wan jî nade. Parlemana Fînlandayê biryar li ser qanûnan dide.

Ti guherîn heta niha nehatine kirin. Em hê nizanin ka dê guherînên mihtemel çi tesîrê li dawanameyên şandî yan dawanameyên nû bike. Em dê têkilî li gel te deynin eger guherîn tesîrê li dawanameya te bikin.

Em fehm dikin ku guherînên mihtemel dibe ku bibin sebebên nepiştrastiyê û pirsan. Em dê behsa guherînên mihtemel bikin gava ku agahiyên deqîqtir hebin. Nûtirîn agahî herdem li ser malpera me tên weşandin: migri.fi.

Wezaret bernameya hikûmetê bi cih tînin, qanûnan amade dikin û guherînan pêşve dibin. Eger agahiyên zêdetir li ser nûkirinan bixwazî, dikarî çavdêriya wan li ser malpera şûraya dewletê amadekirina qanûnan û projeyên pêşxistinê (valtioneuvosto.fi) (tenê bi fînlandî û swêdî). Daîreya Koçberan li jêr rêberiya wezareta hindir û wezareta kar û aborî dixebite.